Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :968 | 5-Hezîran- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | 423165

# Li Gundê Cirnikê jiyana komînal

**Zeyneb Şero ya ji Gundê Cirnika Piçûk ku nêzî 43 salî ye li wir dijî, qala jiyana gundê xwe ya komînal û alternatîf dike û di heman demê de dibêje çi jî bibe emê ji gundê xwe nederkevin.**

Mirov ji bo bi mirovên din re tevbigere û ji hev hez bike hatine afirandin. Helbet jiyana civakî û komînal jî aliyekî jiyana mirovî ye nayê paşguhkirin ku têkiliya di navbera ferd û civakê wê de bi hevdû ve girêdayî ye û bi xurtî bandorê li hev dikin. Bêguman di roja me ya îro de jî ev yek ne hatiye windakirin, bi taybet pergalek li Rojavayê Kurdistanê heye ku her dem bi demokratî, jiyana komînal û bihev re tevgerandin bang dike. Li Kolana Cirnika Kevin ku wekî gundekî ji bajarê Qamişlo- Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tê hesibandin, hîn jî ev rihê komunaltî di kesayetiya mirovên vî de winda nebûye. Şêniyên vî gundî tevî hemû şerên ku li herêmên hatiye jiyîn jî, hîn jî tê de dijîn û bi hev re wekî yekmalbat jiyana xwe bi rê ve dibin. Zeyneb Şero ya ku li Gundê Cirnika Kevin a bajarê Qamişlo- Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ku ev 43'ê sal in lê jiyan dike, der barê jiyana gund de ji ajansa me re axivî.

### Şêniyên wê yên piçûk bi hev re pîr û kal bûn e

Gund ew cihê ku hilma aramiyê û xwezayê jê tê ye, Gundê Cirnika Bicûk mînaka vê hevokê ya herî mezin e. Di vî gundê ku belkî 50 sal in hatiye avakirin de rihê komînaltî û alternatîfiyê bingeh e. Çiqas êrîş bi ser de hatin û gelek koçber li xwe hewandin jî, lê belê tu kes ji malên xwe nederneketiye. Cîranê wan ê herî nû ji ev 15 salin hatine gund. Hemû şêniyên wê yên biçûk bihev re kal bûne.

### Jiyana komînal ya li Gundê Cirnikê



Zeyneb Şero qala jiyana komînal a di hundirê Gundê xwe de kir û wiha dest bi axaftinê kir: "Nêzî 43 sal in ez hatime vî gundî, destpêkê vala bû û mal tê de tune bûn. Ji ber Rejîma Baas'ê qedexe kiribû ku gel ji xwe re malan ava bike û şaredariya wan malên avakirî xerab dikirin, lewma kesê dixwest ji xwe re odeyek ava bike êvarî destpê dikirin û bi rengekî veşartî heta sibehê bidawî dikirin. Tevî vê yekê jî jiyana me ya bi hev re a komînal me bi hêz dike. Ewqas sal derbas bûn û zarokên me jî mezin bûn. Em hemû karên xwe bi hev re diqedînin û çi çêkirina xwarinek be, çi vekirina doşekekê û çi jî mûnet be alîkarî hev dikin, tu kes bi tenê kar nake em giştî bi hev re dibin alîkar."

### "Gurmegurma top an bû, lê dîsa jî em ji gundê xwe ne derketin"

Zeyneb Şero bal kişand ser taybetmendiya Gundê Cirnikê ku ev 45 sal in gelê wê jê derneketine û wiha pêde çû: "Pir tişt hene ku Gundê Cirnik ji cihekî din cuda bike, cudahiya wê jî ew e ku piştî ji şoreşê 11 sal e ji gelên wê ji mala xwe derneketiye û heya roja îro tê de jiyan dikin. Gelek êrîş ser Herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk hatin. Gund xwedî li gelek koçberan derket. Me gelek caran hewandin lê em ji malê xwe ne reviyan, li gund cîranê me yê herî nû hatine 15 salen van xilas bû. Tevî hemû êrîşên dewleta tirk ku gelek caran top û keşif ser serê me digere ku me koçber bike dîsa jî em ne derketin. Gelê Gundê Cirnik gelekî bi axa xwe ve girêdayî ne, di xweşî û nexweşiyê de jî bi hev re ne."

### "Em ji vir narevin, emê di mal û axa xwe de bimirin"

Zeyneb Şero tekez kir ku di çi rewşê de bin jî, ew e heta deqeya dawî ji gundê xwe narevin û wiha dawî li gotinên xwe anî: "Em bi şoreşa xwe ve girêdayî ne û bedena me li ber wê ye ku me tê de zarokên xwe dan û bi hezaran birîndar û şehîd dan. Heya ji min dihat di Mala Jin de çi karê cebhewî be û çi jî karê medenî be min dikir. Çi dibe bila bibe em ji gundê xwe narevin, bila em di malên xwe de û ser axa xwe bimirin. Heya ji destê me bê, em ê nehêlin ku mal û milkê me bi dijmin bîmîne. Dîsa jî em ji vir naderkevin û rê nadin wan çeteyên dewleta Tirk ku destê xwe deynin ser malên me û axa me dagir bikin."

*JINHA*

# Amadekariyên Mihrîcana Jinan ya Zîlan ya 15. dewam dike

**Amadekariyên Mihrîcana Jinan ya Zîlan ya 16. ku wê 18'ê Hezîranê li bajarê Frankfûrtê yê Almanyayê were lidarxistin, dewam in.**

Amadekariyên Mihrîcana Jinan ya Zîlan ya 16'an ku wê 18'ê Hezîranê li bajarê Frankfûrt yê Almanyayê were lidarxistin, berdewam in. Komîteya Amadekar ya Mîhrîcanê, ji bo amadekariyan li Darmstadtê li hev kom bû. Komîteya diyar kir ku wê gelek eleqe nîşanê mîhrîcana ji ber pandemiyê 3 salan bi şûn de tê lidarxistin, bê dayîn û da zanîn ku komîte li wê gorê amadekariyên xwe dike.

Ji xeynî bernameya li ser dikê; standên li ser çanda Kurdan û defîleya cil û bergan hin bernameyên berbiçav ên mîhrîcanê ne. Wê ji bo zarokan jî tişt werin kirin. Saziyên jinan wê bi rengê xwe li tev li mîhrîcanê bibin. Komîteya Amadekariya Mîhrîcana Jinan a Zîlan a 16'emîn da xuyakirin ku hemû amadekariyên mîhrîcanê temam kirine û bi cil û bergên gelêrî li benda jinên Kurd in.

Komîteyê her wiha bang li zarokan jî kir; ''Zarokên delal ên wê mîhrîcana me bi we watedar bibe, hûn jî bi dêya xwe re werin mîhrîcana me.'' Komîte derbirî ku li gelek bajarên Elmanyayê hevdîtinên jî bo jinan jî organîze kirine; di serî de jin, bang li hemû Kurdistaniyên li Elmanyayê û dostên wan kir ku 18'ê Hezîranê berê xwe bidin Frankfûrtê.

*ANF*




## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Ast | Pile, rade, derece, sewiye, hîza, darax. Bilindî û nizimiya tiştekî: Filankes di mijara ziman de ne di asta filankes de ye. |
| Belge | Tişta ku tiştekî misoger dike. Delîl, govan, dokûment. Sûcê filankesê hat belgekirin. Belgeya ku min pere dayînê di destê min de ye. |
| Dane | Agahî. Daneyên di destê me de têra sûcdarkirina wî dikin. |
| Demografî (Fransî) | 1.Lêkolînên li ser komên mirovan yên ku li herêmekê dijîn. 2.Gelhe, nifûs, xelk, komên mirovan yên li herêmekê dijîn. Dagîrker demografiya Kurdistanê diguherînin. |
| Klînîk (Fransî) | Ciyê ku venêrîna nexweşan lê tê kirin. |
| Maske (Fransî) | Rûpoş, berû, girtek, rûyîn, mask, berdevik |
| Nivîsgeh | Dezgeh, daîre, bûro, ofîs. Ciyê ku karê nivîsê lê tê kirin. |
| Sînevizyon (Fransî) | Ekranên gelek mezin, televizyonên gelek mezin. |
| Stratejî (Fransî) | Ji bo demên dirêj plan û proje. |
| Venêrîn | Pişkinîn, teftêşkirin: Di ketina bajêr de endamên asayişê li me venêrîn. Bijîşk li nexweş venêrî. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | R | ■ | L | A | M | ■ | K | Î | N |
| 2 | O | T | O | R | Î | T | E | ■ | A |
| 3 | J | Î | ■ | D | ■ | A | R | A | V |
| 4 | ■ | R | A | ■ | A | L | Î | ■ | M |
| 5 | A | ■ | B | E | J | Î | ■ | N | A |
| 6 | L | A | ■ | H | O | ■ | P | Û | L |
| 7 | A | D | A | R | ■ | T | E | ■ | Î |
| 8 | ■ | I | ■ | A | B | O | R | Î | ■ |
| 9 | F | L | A | M | A | ■ | E | N | E |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 2 | | ■ | | | | | ■ | | |
| 3 | ■ | | | ■ | | | | | |
| 4 | | | | | | ■ | | ■ | |
| 5 | | ■ | | | | | ■ | | ■ |
| 6 | | | ■ | | ■ | | | | |
| 7 | ■ | | | ■ | | | | ■ | |
| 8 | | | | | | | ■ | | |
| 9 | | ■ | | | ■ | | | | |

### ÇEP-RAST

1. Dijberê rengî spî... Ji bo dem û zeman, nîveka destpêk û qedanê
2. Postê gurandî... Dema mirov şîr bidoşe û dest nedê tebaqeya bi ser dikeve, qeymax
3. Vexwarina sereke... Navçeyeke Mêrdînê
4. Amadebûna hilanîna lengerê keştiyê
5. Cureyekî zad ku piranî şorbe pê tê çêkirin
6. Bi rûsî erê... Encam, netîce
7. Notayek... Ji vir û şûnde, ji niha pê de
8. Xwarina ku bêhna dûyî di çêja wê de pêk hatiye... Cînavka şexsê sêyemîn ji bo rewşa netewandî
9. Baneşana keserê... Mektûb

### JOR-JÊR

1. Yezdanekî misrî... Genimê hêrandî... Kurteya beriya zayînê
2. Birayê bavê mirov... Xweliya piştî şewatê
3. Bi şev çêrandina pez... Kurteya Ajansa Fezayî ya Ewropayê
4. Hest û daxwaza tolhildanê... Baneşana kêfxweşiyê
5. Zengil... Li Colemêrgê gotina 'yek'ê
6. Roja em tê de ne... Cihê ku ka lê tê berhevkirin
7. Rêxistina polîsan a naziyan... Pirsek di rewşa ne tewandî de
8. Rastêşek... Tevgera hewayê... Cînavka pirhejmariyê ya xwerû
9. Ferişteyên bihuştê... Navber, mesafe

# Yekîtiya gelên herêmê serkeftinê misoger dike



Bi armanca şkandina vîna gelên herêmê û têkbirina projeya Biratiya Gelan, dewleta tirkî ya dagîrker êrişên xwe yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê didomîne. Di nava bêdengiya cîhanê de, dagîrkerî û çeteyên wê, gefên xwe li ser herêmê zêde dikin û ji bo qirkirina gelên herêmê bi hêzên navdewletî re di nava bazarê de ne. Li ser vê mijarê siyasetmedar û endamê Desteya Disiplînê ya PYD'ê Luqman Caro ji me re axivî. ***R-4***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 968 | 5-Hezîran- 2022 | www.ronahi.net/ku/

## 'Perwerdeya 'refa zabita' bi 31 endamên asayişa jinan dest pê kir'

Bi armanca perwerdekirina bîrdozî, fikrî û leşekerî, 31 endamên Asyişa jinan ya bakur û rojhilatê Sûriyê, 1`ê vê heyvê derbasî perwerdeya `refa zabite` ya bi navê Şehîd Hîra Wan (Rûken Botan) bûn. ***R-2***

# BERSIVA GERÎLA YA LI DIJÎ ARTÊŞA TIRK HAT PÎROZKIRIN

## NPG: Bi hosteyiya taktîkê û ruhê bilind yê Gerîlayên Azadiyê dijmin têk diçe

Fermandariya Biryargeha NPG'ê peyameke pîrozbayiyê ji gerîlayên Pêngava Şehîd Savaş Maraş û Cenga Xabûrê re şand û got, gerîlayên me yên bi rengê fedayî şer dikin, artêşa tirkî ya faşîst tengav kirine û planên wan yên dagîrkeriyê xera krine. Em hevriyên xwe yên ku bi rengê fedayî şer dikin hemûyan, bi heskirin û rêzdarî silav dikin. Serketinê ji wan re dixwazin."

**Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG) got:**

*"... Artêşa Tirk a dagirker şeva 25'ê Gulanê êrişên xwe li rojavayê Ava Zê û qada Metînayê berfireh kir. Hêzên me yên gerîla li dijî vê pêla nû ya êrişê ya dijmin, bi pêngavên şoreşgerî yên Şehîd Savaş Maraş û Cenga Xabûrê bersiveke bi bandor dan, di encamê de jî dagirkeran windahiyên giran dan. Kêliya ku artêşa Tirk a dagirker gav avêt qadên berxwedanê yên Girê Hakkarî, Girê Cûdî û Girê FM'ê, tîmên me yên bi tevger ên bi profesyonel ku xwe bi ruhê fedaî yê Apoyî xurt kirine, li dijî hêzên dagirker rêze çalakiyên serketî lidar xistin...



*30'ê Gulanê li dijî dijminê ku dixwest xwe bigihîne ser serê Girê FM, di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Savaş Maraş de tîmên me yên bi tevger çalakiyeke êrişê ya serketî li dar xistin. Di encama vê çalakiyê de bi ser 10 cenazeyên dijmin ve çûn, 3 çekên MPT-55 û hin ji malzemeyên leşkerî hatin desteserkirin..." ***R-3***

## Ji ber qirêjbûna ava Firatê li Dêrazorê nexweşiyên cuda belav bûne

Ji ber kêmbûna rêjeya ava Firatê ku dewleta Tirkan ya dagîrker li ser xaka Sûriyê qut dike, êdî çem bûye cihê belavbûna nexweşiyan û ava wê nayê vexwarin. ***R-6***



## Jina Kurd di şoreşa Rojava de ji tinebûnê hebûn afirand

Efaf Hiskê diyar kir ku jina Kurd ya helbestvan li Rojava xwe isbat kir û got, şoreşa Rojava ji bo jinên Kurd vejîneke nû bû. ***R-2***



## Dibistana yekê ya şanoyê li bakur û rojhilatê Sûriyê

Rêveberê Dibistana Şano ya Zarokan got, berê zarok ji şanoyê bêmaf bûn. Lê dibistan ji wan re bû derfeteke mezin û ji paşroja huner û sînemayê re bû bingeheke xurt. Bi mihrîcan û şanoya kolanê ya zarokan jî wê proje mezintir bibe. ***R-7***

## `Emê li pêşiya xeyalên Tirkiyê bisekinin`

Welatiyên bajarê Til Temir diyar kirin ku dewleta tirkî ya dagîrker bi êriş û kiryarên xwe yên hovane gelê herêmê dike amanca xwe û dixwaze cografya xwe fireh bike. Herwiha gotin, ji bo bêbandorkirina êrişan û pêşîgirtina li wan lihevkirin pêwîst e. ***R-5***

## Rejima Şamê zanîngeh kirine sîleh

Berpirsên Zanîngeha Firatê ya ser rejima Şamê, du vebijêrkan datînin pêşiya xwendekaran, yan wê li dijî Rêveberiya Xweser û QSD'ê rabin, yan jî wê fakûlteyên wan veguhêzin Dêrazorê. ***R-7***

### Pêşdîtinên Rêber Apo



Faruk Sakik

***R-4***

### Ha li Rojava gotin na, ha li Başûr fermana êrişê dan!



Idrîs Henan

***R-5***

## Giştînameya veguhastina genim û cezayên kesên binpê bikin, hat derxistin

Ji bo parastina ewleyiya xwerek li bakur û rojhilatê Sûriyê, Rêveberiya Xweser giştînameyek bi jimara 11'an derxist. Tê de tê diyarkirina ku ji bilî nivîseke fermî qedexe ye genim di nava rêveberiyên xweser û sivîl re were veguhestin, herwiha kesên giştînameyê binpê bikin wê werin cezakirin. ***R-3***

# ‘Perwerdeya ‘refa zabita’ bi 31 endamên asayişa jinan dest pê kir’

Bi armanca perwerdekirina bîrdozî, fikrî û leşekerî, 31 endamên Asyişa jinan ya bakur û rojhilatê Sûriyê, 1`ê vê heyvê derbasî perwerdeya `refa zabite` ya bi navê Şehîd Hîra Wan (Rûken Botan) bûn.

**Darîn Silê-Qamişlo**

Hêzên Ewlekariya Hundir ya Jinan (Asayişa Jinan) li bakur û rojhilatê Sûriyê hêza yekê ya parastina jinan e, ku di destpêka şoreşa Rojava de li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê hat damezirandin. Asayişa Jinan ji bo parastina jinan û civaka bakur û rojhilata Sûriyê, di tevayiya aliyan de kar dike. Herwiha ji bo avakirina ewlekarî û aramiyê li herêmê dixebite.

Tevî gelek zehmetî û derfetên kêm karibû li seranserê bakur û rojhilatê Sûriyê şaxên xwe belav bike û xwe bi rêxistin bike. Asayişa Jinan, ji dema damezirandina xwe ve heta niha, rola xwe di êrişên li dijî herêmên bakur û rojhiatê Sûriyê, herwiha di çareserkirina pirsgirêkên civakî û parastina herêmê de dilîze. Ev hêz li kêleka kar û xebata xwe endamên xwe di her alî de perwerde dike û wan li ser fikir û felsefeyeke demokratîk ava dike. Çimkî di ewlekariyê de barê herî giran li ser milê jinan e.

Ji bo pêşxistin û xurtkirina fikir û îradeya jinan, Fermandariya Giştî Ya Hêzên Ewlekariya Hundir ya Jinên bakur û rojhilatê Sûriyê, 1`ê vê heyvê Fakûlteya Ewlekariya Hundir ya Asayişa Jinan (refa zabîte) li Akademiya Şehîd Hîra Wan (Rûken Botan) li gundê Girsor yê girdayî bajarê Qamişlo vekir. Di fakûlteyê de, wê 31 jin ji Asayişa bakur û rojhilatê Sûriyê werin perwerdekirin. Ev perwerde hem ji aliyê fikrî, hem jî ji aliyê leşkerî ve pir girîng e û wê ji her alî ve dagirtî be. Herwiha wê perwerde 3 heyvan dewam bike.
Derbarê mijarê de endamên Hêzên Ewlekariya Hundir ya jinên bakur û rojhilatê Sûriyê bal kişandin ser girîngiya perwerdê, herwiha rola Asayişa Jinê di parastina herêmê de û nêrînên xwe ji me re anîn ziman.



Rêvebera Asayişa Giştî ya bakur û rojhilatê Sûriyê Helîma Mehmûd Bekir diyar kir ku demeke dirêj e amedekariyên perwerdeya refa zabite dikin û axaftina xwe wiha domand: “Li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê hevalên jin tevlî vê perwedeyê bûne. Perwerde wê bi zimanê kurdî bê dayîn. Hevalên ku tevlî perwerdeyê bûne tev di asta rêveberiyê de ne, hin ji wan jî berî niha rêvebertî kirine. Ev perwerde hem fikrî û meslekî, hem jî leşkerî ye.”

**`Armanc pêşxistina Asayişa jinê ye`**

Helîma got, armanca me ji vê perwerdeyê, pêşxistina Asayişa Jinan e û wiha pê da çû: “Ji ber ku em di rewşeke awarte de dijîn û ji her alî ve êriş li ser gelê me tên kirin, pêwîstiya me bi perwedeyên wisa heye. Da ku jinên di ewlekariya hundir de xebatê dikin xwe di nava civakê de bi rêxistin bikin û bibin bersiva pirsgirêkên civakê û êrişên dijmin.”

Helîma Bekir di dawiya axaftina xwe de da zanîn ku wek hêza ewlekariya hundir ji bo her rewşê amade ne û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Wek asayişa bakur û rojhilatê Sûriyê çi êriş li ser xaka me bên kirin, emê cihê bersivê bin. Dijmin çiqas êriş bike emê perwerde û pêşketinên xwe dewam bikin. Herwiha emê serkeftin û destkeftiyên şehîdên xwe biparêzin.”

**`Perwede ji bo me derfeteke pîroz e`**



Endama asayişa jinan ya herêma Firatê Nûdem Xelîl jî axivî û got, wek Hêzên Ewlekariya Hundir ji destpêka şoreşê ve, em têkoşînê dikin heta ku gihîştin vê astê. Ji bo wê jî wek jin heta ku em bikarin emê têbikoşînê bikin û hêza xwe pêş bêxin. Herwiha emê perwedeyên xwe dewam bikin. Niha jî bi tevlîbûna 31 jinan emê perwerdeya xwe dest pê bikin. Perwerde ji bo me derfeteke pîroz e. Nûdem wiha berdewamî da axaftina xwe: “Wek hevalên jin em pir kêfxweş in ku me cihê xwe di nava civakê de dîtiye. Ez bi hêvî me tevayiya hevalên tevlî perwerdeyê bibin sûdê baş jê bigirin û vê perwerdeyê ji xwe re bingehekî pîroz bibînin. Herwiha di aliyê fikir û zanebûnê de xwe pirtir pêş bixin.”
Nûdem Xelîl di dawî de serkeftinê ji tevayiya jinan re bi taybetî endamên perwerdê re xwest û got, em bi hêvî ne perwerdeyên bi vî rengî zêde bibin. Da ku em şexsê xwe pêş bixin û civaka xwe biparêzin.



# Jina Kurd di şoreşa Rojava de ji tinebûnê hebûn afirand

**Navenda nûçeyan-Qamişlp**

**Efaf Hiskê diyar kir ku jina Kurd ya helbestvan li Rojava xwe isbat kir û got, şoreşa Rojava ji bo jinên Kurd vejîneke nû bû.**

Di cîhanê de gel û civakên bêwêje nehatine dîtin. Ji bo ku gel û civak bi tunebûnê re rûbirû nemînin, di şerê man û nemanê de ketine pêşbaziyê. Ew gelê ku ziman, çand û wêjeya xwe parast û bi pêş xist, cihê xwe di lîsteya hebûnê de tomar kir.Di vê pêşbaziya man û nemanê de gelê Kurd xwedî helwestên berbiçav bû ku xwe li ser piyan bigire û hebûna xwe isbat kir. Bêguman rola jina Kurd di vê parastin û pêşketinê de roleke sereke û berbiçav e. Yek ji helbestvanên jin yên Kurd li Rojavayê Kurdistanê Efaf Heskê ye, ku dikarîbû bi riya nivîsandina helbestan hest û ramanên xwe derxe holê. Herwiha bi helbest û nivîsên xwe hêstên xwe bi civakê re dide parvekirin û peyamekê bi helbestên xwe vedibêje. Li ser jina Kurd ya helbestvan û kurtejiyana xwe, nivîskar û helbestvana Kurd Efaf Hiskê ji me re axivî.

**Bingehê afrandinê civak e**

Efaf Hiskê diyar kir ku wê di temenê xwe yê piçûk de dest bi nivîsa helbestan kir û wiha got: “Di temenekî piçûk de min dest bi nivîsê kir. Ya ku bandor li min kir civak bû. Di temenê 18 salî de min dest bi xwendina pirtûkan kir û di demeke kurt de min mijarên ku li ber çavên min diqewimîn dinivîsandin. Li dibistanê dema mamosteyên min mijarek ji min dixwestin, min dinvîsand lê wekî helbestan derdiket. Malbat, heval û mamosteyên min yên dibistanê alîkariya min kirin û destek dane min. Herwiha yê ku zêde piştgiriya min kir jî, birayê min bû. Lê di wê demê de ji ber zehmetiya bidestxistina pirtûkan û siysetên li dijî Kurdan min gelek zehmetî dîtin. Ji ber ku min gelek pirtûkên Erebî û Kurdî xwendin, ez di demeke kurt de pêş ketim. Min giranî da nivîsandina helbest û mijarên civakî “

**Xebat û berhem**

Efaf bal kişand ser hin kar û xebatên xwe û wiha domand: “Bi destpêkirina şoreşa Rojava re , min cihê xwe di nava damezirînerên saziya zimanê kurdî li herêma Cizîrê girt. Di qada çandê de min kar kir û hîn jî xebatên min berdewam in. Herwiha ez yek ji damezirîner û endama Yekîtiya Rewşenbîrên Kurd bûm. Sala 2013’an min dest bi nivîsandina helbestên kurdî kir . Helbesta min ya yekê bi navê ‘Bihêle Rûpela Min Bibêje’, bû. Di festîvala jin ya yekemîn ya 2015’an de ya li herêma Cizîrê, min ya yekê girt. Ez di gelek festîvalan de beşdar bûm. Herwiha helbestên min di gelek kovarên cîhanî de hatin weşandin, Wekî kovara Siwêdê û Misrê”

**Şoreşa Rojava ji helbetvanan re bû şans**

Efaf da zanîn ku şoreşa Rojava vejîneke nû bû ji bo jinên Kurd, bi taybetî ji bo jinên helbestvan û wiha domand : “ Ji destpêka şoreşa Rojava jina Kurd roleke sereke di rêxistinbûyên û birêvebirina civake de lîst. Helbestvan û nivêskarên jin di rêza yekê ya şoreşê de bûn. Beriya şoreşê jin bi tirs nêzî wêjeyê dibû û ji aliyê civakê nedihat qebûlkirin. Yek ji wan jinan jî ez bûm, min ji şoreşa Rojava hêz girt û dest bi nivîsa pirtrûkan kir. Li bakur û rojhilatê Sûriyê jina helbestvan gihiştiyê asteke bilind û nasnameya xwe ya nivîsê dayê pêş. Gelek jinên nivîskar bi şoreşa Rojava re derfeta pêşketinê dîtin û xew pêş xistin. Herwiha gaveke pir mezin avêtin û dikarîbûn bibin pêşengên civakê.”



Helbestvan û nivîskara Kurd Efaf Hiskê diyar kir ku şoreşa Rojava şoreşa çand û wêjeya kurdî ye û axaftina xwe wiha qedand : “Pewîst e em zarokên xwe fêrî çanda xwendinê bikin. Herwiha divê em bi pênûsên xwe têkoşîna gel binivîsin û bibin şahidên berxwedanê.”



# Dibistana yekê ya şanoyê li bakur û rojhilatê Sûriyê

Rêveberê Dibistana Şano ya Zarokan got, berê zarok ji şanoyê bêmaf bûn. Lê dibistan ji wan re bû derfeteke mezin û ji paşroja huner û sînemayê re bû bingeheke xurt. Bi mihrîcan û şanoya kolanê ya zarokan jî wê proje mezintir bibe.

**Xalid Etê/Qamişlo**

**Perwerdeya duduyan ya dibistana Şano ya Zarokan dest pê kir**

Dibistana Zarokan ya Şanoyê ji aliyê Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê ve meha 10`an ya sala borî hat vekirin. Ev çend roj in jî li navenda Mihemed Şêxo ya çand û hunerê, beşa duduyan ya perwerdeya şano ya zarokan dest pê kiriye. Berî niha jî vê dibistanê beşeke din ya şanoyê ya zarokan bi dawî kiribû. Li ser kar û xebata Dibistana Zarokan ya Şanoyê, rêveberê Dibistanê Ebdulmecîd Xelef ji me re axivî.



Ebdulmecîd Xelef diyar kir ku ji bo avakirina vê dibistanê, sala borî pêşiniyar ji bo Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê kiribûn û ji projeyê re amadekarî hatibû kirin. Herwiha got, piştî erêkirina projeyê ji aliyê Desteyê ve jî, Cotmeha sala borî xebata dibistanê dest pê kir. Ev dibistana şano jî, dibistana yekê ya zarokan li bakur û rojhilatê Sûriyê ye.

**`Zarok ji şanoya xwe bêpar û bêmaf bûn`**

Rêveberê dibistanê da zanîn ku armanca wan ji vekirin vê dibistanê, berfirehkirina qada şanoyê li herêmê ye û axaftina xwe wiha domand: “Li herêmê pêwîstî bi qadeke şanoya zarokan hebû ku bingeha paşroja şanoyê bê avakirin. Ji ber wê me dest bi vê projeyê kir. Herwiha ji aliyê şanoyê ve jî mafê zarokan hatibû xwarin û çalakiyên şanoyê yên heyîn di çarçoveya şanoyên mezinan de dihatin kirin. Piştî erêkirina projeyê me bi desteya perwerdeyê re têkilî danî û me projeya xwe da nasîn.”

**Ekîba perwerdeyê**

Li gorî planên dibistanê, her dewreyeke perwerdeyê sê mehan didome. Di pewreya yekê de jimara zarokan 30 bû. Ya niha jî ango ya duduyan 20 bû. Ev proje ji aliyê komîteya perwerdeyê ve tê meşandin. Komîte, ji şanoger, derhêner û nivîskar Ebdulcabir Hebîb, dîkorzan Ciwan Silo û alikarê wan Alan Ebdulah pêk tê.

**`Dibistan ji bo zarokan derfeteke mezin e û gelek pêşkeftin çêbûn`**

Li ser hûrgulî û bernameya perwerdeyê Ebdulmecîd Xelef ev agahî dan: “Ekîba perwerdeyê, ji nîvîskar, şanoger û derhêneran pêk tê û ekîbeke biezmûn û şareza



ye. Li gorî nûbûna projeyê asta tevlîbûna zarokan jî baş e. Temenê kesên beşdarî perwerdeyê dibin jî, ji deh salî û jor ve ye. Dema zarok bi lîstikvanên mezin re perwerdeyê dibînin, moral û heskirina wan mezin dibe û baweriya cewherî pêş dikeve. “

**`Zarokên şanoyê paşroja huner û sînemayê ne.`**

Nivîskar Ebdulmecîd teqez kir ku bi vê dibistanê gelek gavên mezin hatin avêtin û axaftina xwe wiha domand: “Berê, qada şanoyê bi hesreta zarokekî lîstikvan bû. Di vî alî de me gelek astengî dîtin. Lê niha rewş hatiye guhertin. Niha zarokên dibistanê ji şanoyê re bûne xezîne û pêwîstiyên sînemayê jî pêşwazî dike. Herwiha bi riya desteya çandê, wê zarokên dibistanê bibin pêşkêşvanên televizyona ARA zarok jî. Ev ji raghilandina zarokan re jî bû piştgirî û wê pêşkêşvaniyê di mihêrcanan de bikin.”

**Mihrîcana şanoya zarokan…**

Mihrîcana yekane ku ji bo şanoya zarokan hatbû lidarxistin, sala 2016`an bû. Li ser mihrîcanên zarokan, Ebdulmecîd Xelef eşkere kir ku wê her sal nêzî 150 zarokan perwerde bikin û wiha got: “Her ku perwerdeyek bi dawî bibe, wê zarok du şanoyan pêşkêş bikin. Herwiha her ku sê beş bi dawî bibin wê 4 şanoyan pêşkêş bikin û mihrîcaneke taybet ji bo zarokan bê lidarxistin. Di plana me de ye ku dibistana şanoyê li bajarê Dêrikê, Girkê Legê û Hesekê bigere û şanoyan pêşkêş bike. Eger derfet hebe emê biçin Reqa jî, bi her du zimanan (kurdî û erebî) şanoyan pêşkêş bikin.”

**Projeyên paşrojê û şanoya kolanê…**

Rêveberê Dibistana Şano ya Zarokan Ebdulmecîd Xelef bi van agahiyan axaftina xwe qedand: “Dibistanê gavên girîng avêtin. Herwiha qadeke din ya hunera zarokan afirand û xurttkir. Lê em hewl didin hê pirtir gavan biavêjin. Wê her nifşek ji van perwerdeyan li ser qonaxan û di nava sê salan de dewam bike. Ji bo pêşkêşkirina şanoya zarokan li kolanan jî kar tê kirin û film û skêç jî wê bên amedekarin.”

# Rejima Şamê zanîngeh kirine sîleh

**Berpirsên Zanîngeha Firatê ya ser rejima Şamê, du vebijêrkan datînin pêşiya xwendekaran, yan wê li dijî Rêveberiya Xweser û QSD’ê rabin, yan jî wê fakûlteyên wan veguhêzin Dêrazorê.**

Berpirsên Zanîngeha Firatê ya ser bi rejîma Şamê, du vebijêrkan datînin pêşiya xwendekaran, yan wê li dijî Rêveberiya Xweser û QSD’ê rabin, yan jî dê fakulteyên wan veguhêzin Dêrazorê. Bi vê yekê bi siberoja 30 hezar xwendekaran dilîzin. Ev careke din niyeta hikûmeta Şamê a polîtîzekirina perwerdeyê eşkere dike.

Hikûmeta Şamê bi rêya parêzgerê Hesekê Xesan Xelîl beriya çend mehan, hewl da bi hincetên wekî êrişên çeteyên DAIŞ`ê yên li dijî taxa Xiwêran fakulteyên Zanîngeha Firatê ji Hesekê bibe Dêrazorê û çend mehan jî dewama fakulteyan da rawestandin.

Bi armanca têkbirina ewlehî û îstiqrara herêmê cihgirê serokatiya Zanîngeha Firatê û Berpirsê Fakulteya Hiqûqê ya li Bajarê Hesekê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di ezmûnên niha de xwendekaran li dijî Rêveberiya Xweser û QSD`ê sor dikin û ji xwendekaran re gotine, heger hûn li dijî her du aliyan derneke-vin, ew ê fakulteyên Zanîngeha Firatê veguhêzin Dêrazorê.
Rêveberiya Xweser helwêsta hikûmeta Şamê wekî reva ji berpirsyariya xwendekaran bi nav kir, da ku fakulteyan bi hincetan veguhêze herêmên din û rastiyan berovajî bike.
Li gorî malperên medya civakî, her wiha hin xwendekarên ku ji ber sedemên ewlehiyê navên xwe eşkere nekirin, ji ANHA’yê re gotine, ew ji biryara fakulteyê ne razî ne mat û bêhêvî mane.

**Gef xwarin ku fakûlteyê veguhêzin**




Xwendekaran îşaret bi tevdîrên bi destpêkirina ezmûnan re kir û got, “Berpirsê Fakulteya Hiqûqê Ebdullah El-Selmo bi me re civiya û ji me re got, cihgirê serokatiya Zanîngeha Firatê Mihemed El-Tehtûh wê bê serdana zanîngehê da ku li nêrînên we guhdarî bike. Di nav axaftinên xwe de berpirs ji xwendekaran xwest ku li ser ragihandina ji nişka ve ya destpêkirina ezmûnan, nerazîbûnên xwe nîşan nedin û gef xwar ew fakulteyan ber bi bajarê Dêrazorê ve veguhêzê. Xwendekar ji ber tirsa ji bo siberoja xwe, gotina berpirsê fakulteyê qebûl kirin.”

**Xwestin xwendekar li ber Rêveberiya Xweser rabin**

El-Tehtûh di civînê de ji xwendekaran xwest ku li ber Rêveberiya Xweser û QSD`ê rabin, û heger vê yekê nekin, ew ê fakulteyan veguhêzin Dêrazorê û wan ji ezmûnên bê, bêpar bihêlin.
Hêjayî bibîrxistinê ye ku 30 hezar xwendekarên ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê li fakulte û peymangehên şaxê Zanîngeha Firatê ya Hesekê li 8 fakulte û 12 peymangehan dixwînin.
*ANHA*

# Ji ber qirêjbûna ava Firatê li Dêrazorê nexweşiyên cuda belav bûne

Ji ber kêmbûna rêjeya ava Firatê ku dewleta Tirkan ya dagîrker li ser xaka Sûriyê qut dike, êdî çem bûye cihê belavbûna nexweşiyan û ava wê nayê vexwarin.

Dewleta Tirkan ya dagîrker di kêmkirina rêjeya ava Firatê de berdewam dike, di encamê de li herêmên gundewarê rojhilatê Dêrazorê jîngeh qirêj bûye û gelek nexweşiyên wekî jehrî û nexweşiyên çerm berbelav bûne.

Şêniyên gundewarê rojhilatê Dêrazorê ava Firatê paqij dikin û piştre vedixwin, ev jî badnorê li sîstema parastinê ya laş dike. Welatiyê ji gundewarê rojhilatê Dêrazorê Nebîl El-Mihemed got, ew li ber deriyê navenda tenduristiyê ya bajarokê Ebû Hesen ê rojhilatê gundewar li bendê bû ku kurê xwe yê pitik derman bike. Piştî kontrolkirinê hate xuyakirin ku ji ber qirêjbûna avê kurê wî jehrî bûye.

Nebîl El-Mihemed diyar kir ku kurê wî zikêşî bûye, lê wan nedizanî ji ber qirêjiya avê ye. El-Mihemed wiha got: “Ez her tim derman ji zarokên xwe yên din re dibim, ji ber ku ew jî zehmetiya pirsgirêkên tenduristiyê dikişînin.”

El-Mihemed bang li komîteya tenduristiyê û aliyên peywendîdar kir ku destekê bidin navendên tibî, derman û destwerdanên lezgîn dabîn bikin da ku ew jî xizmeta gelê herêmê bikin û azarên wan jî sivik bikin.

Hemşîreya li navenda tenduristiyê ya Ebû El-Hesen, Hemde El-Mensûr anî ziman ku rojane 30 nexweş serlêdana navendê dikin, zêdetirî 15 ji wan ji ber ava qirêj jehrî bûne û yên din jî roviyên wan îltîhab girtiye û mada wan diêşe, hem jî pirsgirêkên çerm belav bûne. Hemde El-Mensûr da zanîn ku navend li gorî derfetên xwe destwerdanên destpêkê ji nexweşan re dikin, ji wan sîrom û dermanên daxistina germahiya laş, ji ber ku ev nexweşî dihêle germahî bilind bibe.







Hemde El-Mensûr destnîşan kir ku navenda tenduristiyê her tim di amadekariyê de ye, nexasim dema bahoz radibe ji ber ku hin kes hene ji ber tozê dixeniqin. Ew ê bi hemû derfetên xwe xeteriya jehriyê derbas bikin, bi taybet di nav zarokan de.
Hemde El-Mensûr di dawiyê de banga destekdayîna ji hemû navendên tenduristiyê yên li rojhilatê gundewarê Dêrazorê kir, bi taybet di vê demê de ji ber ku ava Firatê ji berê qirêjtir bûye, her wiha rewşa hewayê jî tê guhartin.

Hevserokê Komîteya Tenduristiyê ya Meclisa Herêma Rojhilat Mişel El-Sultan axivî û got, sedema sereke ya jehrê ew e ku ava Firatê qirêj bûye û rewşa hewayê dem dem tê guhartin.
El-Sultan anî ziman ku li gorî raporên rojane têne navenda tenduristiyê ya gundewarê rojhilatê Dêrazorê, zêdetirî 175 kes bi jehrî, îltîhba roviyan û nexweşiyên çerm in. Ev hejmar jî rojane zêde dibe.
***ANHA***

## “Eger civak jinan bi awayekî baş binirxîne wê tundituji çênebe”

**Ji ber sedemên fikrên mêrsalarî mezindîtina zayenda mêr ji ya jinan, her dem di nava civaka Kurd de bi çavekî lewaz li jinan hatiye nêrîn û girîngî nedane rola wan, her çendî ku jinan di dîrokê de ewqas ked û têkoşîn dane jî.**

Dayîk-jin di dîrokê de xwediya rolek bandorker in, perwerde û rêvebirina civakê, gelek şoreşên weke şoreşa kiştukal, dahênan û pêşketin bi destên dayik-jinê çêbûn. Her wiha gelê Kurd weke gelê herî kevnar ê Rojhilata Navîn her dem dayikan di aliyê perwerde, dahênan û siyasetê de pêşengî kiriye û li hemberî hemû cureyên dagirkeriyê sekiniye.
Dayik-jin malbatê perwerde kirine û xwedî rolek girîng in lê belê her dem di nava civakê de wek kesa duyem hatiye hesibandin û jin weke nezan û bêhêz lê hatiye dîtin. Civak bi giştî û bi taybet mêr girîngî nedane rola jinan.

### “Divê jin ji xwe bawer bin û bibin xwedîbiryar”

Jina ciwan Hacer Bekir der barê rola jinan a di nava civakê de wiha axivî û got: “Civaka Kurd civakek ku keda jinan tê de heye û li hemberî wê jî mêr mezin kirine û bûne xwedî hêz, keda mêran zêdetir tê dîtin. Di demek ku jin li gel kar dikin, erkê malbat û perwerdekirina zarokan li ser milên wan e lê belê hewldanên wan nayên hesibandin. Ger civak jinan bi awayek baş binirxîne dê tundituji li hemberî wan neyê kirin. Wekî tê zanîn rojane tundîtujî li hemberî jinan tê kirin.”

### “Zordariya mêr di nava civaka Kurd de rola jinan lewaz kiriye”

Geşbûn Elî diyar kir ku civaka Kurd ji ber fikrên paşverû yên bav û bapîran ji dîrokê ve aqilê mêrsalarî wisa kiriye girîngî nedaye jinan û got: “Ew aqilê ku niha serdest e wisa kiriye ku bawariya jinan bi wan nemîne, vê yekê wisa kiriye ku di malbatê de jiyan lewaz bibe.”

Mamostaya xananîşîn Awaz Hesên der barê rola dayik û jinan di nava civakê de wiha got: “Bi temamî erka malbatê û nifşê nû li ser milnê dayikê ye lê belê di civaka Kurd de, her dem dayik û jin lawaz kirine. Civakek bi tendirust rola dayikê bilind dinirxîne, ji ber ya ku dayik dike tu kes û aliyek nake. Rast e erk dikeve ser milên bav jî lê belê ew erk ji yê jinan kêmtir e. Ji derveyî wê jî her dem rola dayikê di têkoşîn



û şoreşê de hebû heta niha jî heye, dayik zarokan perwerde dike. Lê mixabin li gorî fikrê civakê her dem keda mêr tê dîtin. Ne tenê civak di hinek malbatan de ew rola berbiçav nemaye, zarok û bav girîngî nadin hewldana jinan.”

### “Rola jinan ji ya tê dîtin zêdetir e”

Şewnim Mehemed dibêje: “Herî zêde erk dikeve ser milên dayikê, di demên borî de piraniya jinan tenê erkên malê li ser milên wan bû lê belê niha ji derveyî wê karê ji derve jî dike û perwerdekirina zarok û rêvebirina malbatê li ser milên jinan e. Heta niha civakê, westandina dayikê di nava civak û malbatê de hîs nekiriye. Li beramberî wê hewldana mêran mezin dinirxînin, ev jî wisa kiriye ku di hinek malbata de girîngiya dayikê nemaye. Pêwîst e baweriya jinan bi xwe hebe û di civakê de xwedî li rola xwe dirbikevin.”
***JINHA***

## Li Hîzanê jin ji bo berhevkirina cehterê çiya bi çiya digerin

**Jin li Hîzanê li çiyayan digerin û gelek cureyên giyayan berhev dikin. Hem di xwarinê de hem ji bo çay hem ji bo nexweşiyan bi kar tînin.**

Li bajarê Bedlîsê ku bi erd û çiyayên xwe yên bibereket tê nasîn, jin bi germbûna hewayê re bere xwe didin çiyayan û bêhna xwe derdixin. Jinên Kurd ên ji raboriyê ve heta niha bi giyayên ku li çiya tên komkirin xwarinê çêdikin, dizanin ku her giyayek ku li çiyê şîn dibe dê li ku derê were bikaranîn û ji çi re sûda wan heye. Jinên li Hîzana Bedlîsê hildikşin cihên bilind, ji bo komkirina cehtera çiyê ku di vê demsalê de şîn dibe, bi saetan dixebitin. Jin cehterê, di gelek xwarin û nexweşiyan de bi kar tînin.

### Jin bi hev re catirê ji çiya berhev dikin

Meryem Korkmaz a ku bi kombûna jinan re ji bo komkirina cehtera çiyê, berê xwe dide çiya, bi du poşetên di destên xwe de du cureyên cuda yên cehterê berhev dike. Meryem Korkmaz, anî ziman ku ew hildikşin çiya û diyar kir ku cehtera çiyayî ya ku ew berhev dikin di vê demsalê de şîn dibe û havînê tê zuhakirin.

### “Em westana xwe his nakin”

Meryem Korkmaz ji aliyekî ve cehtera çiyê kom dike, ji aliyekî ve jî



der barê karê dikin de wiha dibêje: “Em ji çiyayên xwe pir hêz dikin. Dema hildikişin çiyayan bêhna me derdikeve. Di meha Gulanê de ew cehter şîn dibe. Em 20 jin kom dibin û her roj biçin kijan çiya yan jî gund cehter an jî caxê kom dikin û vedigerin. Em çiqas biwestin jî qet gilî nakin, ji ber ku dema em vê dikin pir kêfxweş dibin. Mirovên din hemû giyayên ku em kom dikin dikirin lê em hemûyan bi destên xwe berhev dikin û dibin malê. Çiyayên me tije giyayên bi şîfa ne.”

### “Em evîndarên çiyayên xwe ne”

Meryem Korkmaz, destnîşan kir ku cehtera çiya di xwarinên bi goşt de bi kar tînin û bi van gotinên xwe diyar dike ku ew jîngeha xwezayî nade bi jiyana bajêr: “Ev cehter ji bo kuxikê jî pir baş e. Em ji bo kuxikê û nexweşiyên din ên rojane bi kar tînin. Em vê cehterê dikelînin û vedixwin. Tu niyeta me tune ye em dev jê şêwaza jiyana xwe ya li vir berdin. Xwezaya me jî jiyana me jî pir xweş e. Jiyana li bajêr ji me re xweş nayê. Em nikarin li wan deran bijîn.”
***JINHA***



# NPG: Bi hosteyiya taktîkê û ruhê bilind yê Gerîlayên Azadiyê dijmin têk diçe

Fermandariya Biryargeha NPG`ê peyameke pîrozbayiyê ji gerîlayên Pêngava Şehîd Savaş Maraş û Cenga Xabûrê re şand û got, gerîlayên me yên bi rengê fedayî şer dikin, artêşa tirkî ya faşîst tengav kirine û planên wan yên dagîrkeriyê xera krine. Em hevriyên xwe yên ku bi rengê fedayî şer dikin hemûyan, bi heskirin û rêzdarî silav dikin. Serketinê ji wan re dixwazin.»

**Navenda Nûçeyan**

Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG) ji fermandar û şervanên Pêngavên Şehîd Savaş Maraş û Cenga Xabûrê re peyama pîrozbahiyê şand û Şehît Siyabend yê ku di çalekiya Girê Şehîd Akîf de şehît keftî bibîr anî.

Fermandariyê got, “Li dijî êrişên dagîrkeriyê yên artêşa Tirk ya dagîrker ên li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê, Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê bi taktîkên dewlemend û afirîner bersivê didin û derbên giran li dijmin dixin. Gerîlayên me yên bi rengê fedaî şer dikin, artêşa Tirk a faşîst tengav kirine û planên wan ên dagirkeriyê xera krine. Artêşa Tirk a dagirker lewma li pey berfirehkirina qadên dagirkeriyê ketiye. Artêşa Tirk a dagirker şeva 25’ê Gulanê êrişên xwe li rojavayê Ava Zê û qada Metînayê berfireh kir. Hêzên me yên gerîla li dijî vê pêla nû ya êrişê ya dijmin, bi pêngavên şoreşgerî yên Şehîd Savaş Maraş û Cenga Xabûrê bersiveke bi bandor dan, di encamê de jî dagirkeran windahiyên giran dan.

Kêliya ku artêşa Tirk a dagirker gav avêt qadên berxwedanê yên Girê Hakkarî, Girê Cûdî û Girê FM’ê, tîmên me yên bi tevger ên bi profesyonel ku xwe bi ruhê fedaî yê Apoyî xurt kirine, li dijî hêzên dagirker rêze çalakiyên serketî lidar xistin.”

**Di peyamê de işaret bi van xusûsan jî hate kirin:**

“29’ê Gulanê li qada berxwedanê ya Girê Hakkarî, li dijî hêzên artêşa Tirk a faşîst ên dixwestin ber bi çeperên şer ên Girê Şehîd Akîf ve bi pêş ve bên, tîmên me yên bi tevger ji 2 baskan ve çalakiyeke serketî ya êrişê lidar xistin. Di encama çalakiyê de çekeke MPT-55 a dijmin û gelek alavên leşkerî hatin desteserkirin. Ev çalakiya ku di encamê de dijmin windahiyên giran da, hostatiya taktîkê û ruhê bilind ê Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê careke din nîşanî dost û dijminan da. Di vê çalakiya serketî de hevrêyê me Siyabend bi ruhekî bilind ê êrişê û rêbaza fedayî ya Apoyî bi ser dijmin ve çû, li refê herî pêş derba giran li dijmin xist, bi lehengî şer kir û şehîd bû.

30’ê Gulanê li dijî dijminê ku dixwest xwe bigihîne ser serê Girê FM, di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Savaş Maraş de tîmên me yên bi tevger çalakiyeke êrişê ya serketî li dar xistin. Di encama vê çalakiyê de bi ser 10 cenazeyên dijmin ve çûn, 3 çekên MPT-55 û



hin ji malzemeyên leşkerî hatin desteserkirin.
Ruhê êrişê yê bilind û rêbaza lêdanê ya encamgir ku van tîmên me yên bi tevger nîşan dan, hêjayî pesindayinê ye.
Di serî de tîmên me yên bi tevger ku li dijî hêzên dijmin ên dixwazin qadên me dagir bike bi performanseke serketî çalakiyên encamgir lidar dixin, em fermandar û şervanên ku tevlî van çalakiyan bûne hemûyan ji ber serketina wan pîroz dikin. Hevrêyên xwe yên ku ji roja destpêkê ya êrişên dagirkeriyê yên dijmin û pê ve bi wêrekî û biryardariyeke mezin şer kirin û şehîd bûn, bi rêzdarî û minetdarî bi bîr tînin, soz didin şehîdên xwe yên leheng ku em ê teqez bi ser bikevin. Em di wê baweriyê de ne ku pêngavên şoreşgerî yên Şehîd Savaş Maraş û Cenga Xabûrê wê ji niha û pê ve bi serketinên hîn mezintir dewam bikin. Hevrêyan hemûyan ku bi rengê fedaî şer dikin bi hezkirin û rêzdarî silav dikin û serketinê ji wan re dixwazin.”

# Giştînameya veguhastina genim û cezayên kesên binpê bikin, hat derxistin

**Ji bo parastina ewleyiya xwerek li bakur û rojhilatê Sûriyê, Rêveberiya Xweser giştînameyek bi jimara 11’an derxist. Tê de tê diyarkirina ku ji bilî nivîseke fermî qedexe ye genim di nava rêveberiyên xweser û sivîl re were veguhestin, herwiha kesên giştînameyê binpê bikin wê werin cezakirin.**

Hevserokatiya Meclisa Rêveber ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê giştînameyek bi jimara 11’an derxist. Tê de hat diyarkirin ku qedexe ye ji bilî nivîseke fermî ji Şîrketa Pêşxistinê ya Civaka Çandinî genim were veguhestin û kesên binpê bikin wê werin cezakirin.

### Di giştînameyê de wiha hat gotin:

“Ji bo parastina ewlehiya xwarinê li herêmên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li gorî qanûnên benda /k/ ji madeya 176’an a qanûna gumrîkê ya bi jimareya 4 a 2021’an û li gorî giştînameya bi jimareya 57 a di 29.06.2020’an de hatiye derxistin, naveroka wê ew e ku genim qedexe ye were hindardekirin, her wiha li gorî qanûna madeya 188’an ji qanûna gumrîkê ya bi jimareya 4 a 2021’an wiha ye:

1-Qedexe ye genim di nava rêveberiyên xweser û sivîl de ji bilî nivîseke fermi ji Şîrketa Pêşxistina Civaka Çandiniyê were veguhastin.

Dema benda /1/ a li jor were binpêkirin ev ceza tên birîn;
a-Herî kêm cezaya ji sedî 50 tên birîn.

b-Heke binpêkirin dubare bibe, cezaya di navbera hezar heta 10 hezar dolar



tê birîn. Lê heke careke din hate binpêkirin cezaya salekê ya girtinê tê birîn û 5 hezar dolar tên dayîn. Ew jî li gorî benda 1 ji madeya 181 ji qanûna gumrîkê ya 2021’an e.
c-Li gorî bihaya Rêveberiya Xweser diyar kiriye ku her kîloyek bi 2 hezar û 200 lîreya Sûriyê ye, genim radestî Şîrketa Pêxpstina Civaka Çandiniyê tê kirin.

d-Ji bo rakirina cezaya li ser wesayîtên veguhastinê yên di qaçaqiyê de hatine bikaranîn bac ji sedî 20 tê birîn.
***ANHA***

# `Yekîtiya gelên herêmê serkeftinê misoger dike`

Bi armanca şkandina vîna gelên herêmê û têkbirina projeya Biratiya Gelan, dewleta tirkî ya dagîrker êrişên xwe yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê didomîne. Di nava bêdengiya cîhanê de, dagîrkerî û çeteyên wê, gefên xwe li ser herêmê zêde dikin û ji bo qirkirina gelên herêmê bi hêzên navdewletî re di nava bazarê de ne. Li ser vê mijarê siyasetmedar û endamê Desteya Disiplînê ya PYD'ê Luqman Caro ji me re axivî.

**Mihemed Xanim-Qamişlo**

### 'Dewleta tirkî ya faşîst ewleyiya herêmê ji xwe re xeter dibîne'

Caro diyar kir ku dewleta tirkî ya dagîrker, destkeftiyên gelê Kurd wek xeter li ser desthilatdariya xwe dibîne û axaftina xwe wiha domand: "Hikumetên Tirkiyê tevan erîşên ser gelê Kurd ji xwe re kirine çand û bi wan êrişan pirsgirêkên xwe yên hundir vedişêrin. Bi destpêkirina aloziya li Sûriyê re, gelê Kurd sîstemeke demokratîk ava kir. Kurdan pêşengiya projeya Neteweya Demokratîk kir û bi awayekî serkeftî herêm bi rê ve birin. Projeya Neteweya Demokratîk bû bingehê rêxistinbûn û azadiya gelên herêmê. Dema dagîrkeriya tirkî dît ku ev projeya demokratîk pêş dikeve û wê çareseriyê bi xwe re bîne seranserê herêmê, li ser xwe xeter dît. Lewra dixwaze ji aloziya Sûriyê sûdê bigre û amancên xwe yên dagîrkiriyê pêk bîne. Dewleta tirkî ya faşîst li kû derê hebûna azadiya Kurdan hebe, êrişî wê derê dike."



### 'Rûsya û Amrîka di sûcên ku dagîrkeriya tirkî dike de hevkar in'

Caro da xuyakirin ku dewletên wekî Rûsya û Amêrka, ji bo berjewendiyên xwe beşdarî krîza Sûriyê bûn û axaftina xwe wiha domand: "Dagîrkeriya tirkî her dem hewl dide ji pirsgirêkên Rojhilata Navî û cîhanê sûdê bigre. Li ser nakokiyên di navbera welatan de dilîze û amancên xwe pêk tîne. Ji ber ku cih û erdîngariya Tirkiyê ji bo dewletên rojavayî girîng e, her kes dixwaze bi riya bazarên ser Kurdan aramncên xwe bi dest bixe. Dagîrkeriya tirkî li ber çavê tevayiya cîhanê komkojiyan dike. Rûsya û Amrîka qaşo li herêmê garantor in lê xwe bêdeng dikin. Dîroka her du dewletan ji her kesî re diyar e. Ji bo berjewendiyên xwe, çi ji destê wan tê dikin. Ev her du hêz ji gelên azadîxwaz re dijmin in."

### 'Çewisandina vîna azad e armanca dagîrkeriyê'

Caro da zanîn ku armanca êrişên dagîrkeriya tirkî yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê, têkbirina projeya Biratiya Gelan e û axaftina xwe wiha domand: "Tirkiye dixwaze xeta demokrasî û azadiyê tine bike. Dagîrkerî projeya Neteweya Demokratîk li ser xwe xeter dibîne û bi riya bicihkirina malbatên çeteyan li xakên dagîrkirî, dixwaze gelên herêmê yên resen tine bike û ji cîhanê re bibêje ku jimara Kurdan li herêmê kêm e. Projeya xwe ya guhertina demografîk bi her şêwazî dewam dike. Herwiha dewleta tirkî



ya dagîrker dixwaze bi êrişan, îradeya gel bişkîne. Dagîrkerî bi êrişên xwe yên ser sivîlan, polîtîkaya xwe ya qirkirinê didomîne. Siyasetên wê yên dagîrkeriyê li tevayiya qadan têk diçû, ji ber wê bi awayekî hovane êrişî Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê dike"

### 'Yekîtya gelên herêmê wê serkeftinê misoger bike'

Siyasetmedar û endamê Desteya Disiplînê yê Partiyya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Luqman Caro da zanîn ku yekîtiya gelên herêmê wê planên dagîrkeran bêbandor bike û axaftina xwe wiha qedand: "Di vê pêvajoyê de ya herî girîng birêxistinbûn e. Pêwîst e gelên herêmê xwe bi rêxistin bikin û li derdora rêveberiya xwe bibin destek. Proje û fikrê Neteweya Demokratîk, ji gelên Rojhilata Navî re xelasiya ji dagîrkerî û serdestiyê ye. Ji ber wê divê gelên herêmê li gorî wê xwe pêş bixin û nirxên hatine bidestxistin biparêzin. Ji her demê zêdetir pêwîstiya gelên herêmê bi yekîtiyê heye."

## Pêşdîtinên Rêber Apo

**Faruk Sakik**



Rêber Apo derbarê gelek bûyer û pêşketinan de şîroveyan dike. Pêş de hin tiştan dibîne û hişyariyê dide. Dixwaze li gorî vê paradîgmaya wî tev bigerin. Her pêşdîtina wî jî rast derketiye. Dawiya sala 1970'yî, li Stenbolê lokala DDKO. Kesek semînerek bi navê "Dîroka civakê û Pirsgirêka Kurd" dida. Digot: " Li Kurdistanê mêtingerî heye." Di axaftina xwe de peyva "dewleta kurdî" bi kar dianî. Her kes matmayî ma lê kesî ew nas nedikir. Li Stenbolê nû bû. Gotin, ev kî ye, ev çi ye, ew çawa diaxive? Kesek ew nas dikir û got: "Ew, ji Rihayê ye û navê wî Abdullah Ocalan e."
Dema ku ev peyva 'li Kurdistanê mêtingerî heye' got, her kesî ev yek weke xeyal û dewleteke kurdî jî wek fikreke pir zû dît. Lê piştî ku partî ava kir, di rêziknameya xwe de rasteras cîh da vê nêrînê. Li Tirkiyê darbeya 12'ê Îlonê pêk hat, her kesî got; êdî her tişt qediya û ne pêkan e ji nû de vegerin Tirkiyê. Rêber Apo got; 'emê li derve bi rêxistin bibin û ji nû ve vegerin.' Hemû rêxistin belav bûn, lê ji ber ku ew bi rêxistin bû, tersî wan wî şerê çekdarî da destpêkirin.
Gelê Kurd hatibû asîmîlekirin. Li çar aliyê Kurdistanê kurdiyetî êdî li ber tunebûnê bû. Rêber Apo got; 'ez ê vî gelî ji nû de zîndi bikim û ji xewa salan şiyar bikim", kesî bawer nekir û keniyan. Lê ew betona li çiyayê Agirî paremparçe kir û pêvajoya serhildanan da dîtin ku, fikr, raman û paradigmaya wî wê berjewendiyên wan ên li Rojhilata Navîn tehdît bike.
Di sala 1998'an de komplo dane destpêkirin. Gotin wê şerê Kurd û Tirkan bidin destpêkirin, Rêber Apo behsa agirbestê kir û gerîla derxist derveyî welat.
Dema ku bihara gelan dest pê kir û eniya Sûriyê dest pê kir, Rêber Apo xeta sêyem pêşniyar kir. Kurd li gorî vê xeta sêyem tevgeriyan û di 19'ê Tîrmeha 2012'an de li Rojava şoreşek pêk hat. Bingeha vê şoreşê Rêber Apo ji berê de ava kiribû. Li gorî perspektîfên Rêber Apo sîstema konfederalîzma demokratîk hat avakirin. Û di rêveberiya vê herêmê de, ne bi tenê kurd, gelên din ên li herêmê jî cîh girtin.
Di sala 2015'an de, talûkeyeke mezin li Kobanê dît û berê herkesî da wê derê bi baweriya wî Kobanê ji êrişên DAIŞ'ê hat rizgarkirin. Dîsa dema DAIŞ'ê berê xwe da Reqa û Mûsil, wî talûkeya li Şengalê îşaret kir û hin hêzên gerîla şandin wê derê. Ev hêzên li ser pêşdîtina wî çûbûn wê derê, Şengalî ji felaketên hîn mezintir parastin.
Li Tirkiyê ji bo komara demokratîk were avakirin pêngavek da destpêkirin. Rexnekirin kesî bawer nekir. Gotin civakek li ser nirxên nijadperezî û dijminatiya kurdan hatine perwerdekirin ne mimkûn e, bi kurdan re komara demokratîk ava bikin.
Li ser perspektîfên Rêber Apo gel bi rêxistin dibûn. Di destpêkê de bi navê Kongreya Demokratîk a Gelan û piştî demek jî wek partî, "Partiya Demokratîk a Gelan-HDP" hat avakirin. Ev partî di hilbijartinên 7'ê hezîrana 2015'an de da îspatkirin bi van paradigma û nexşerêya Rêber Apo wê demokrasî were Tirkiyê. Hin gelên Tirkiyê ku bi salan bû bi dijminatiya kurdan hatibûn perwerdekirin, piştî ku Rêber Apo nas kirin ew nêrînên xwe yên nijadperestî danîn aliyekî.

Di sala 2014'an de di hevdîtineke muzekereyan de, Sirri Sureya Onder dibêje; Erdogan got; Rojava xeta me ya sor e û em ê destûr nedin li wê statuyeke azad ava bibe. Rêber Apo dibêje; "Ji bo me jî Rojava xeta sor e." Û metirsiya li ser Rojavaya ya îro wî wê demê dîtibû. Gotibû hejmara şervanan derxin 150 hezarî.
Bi êrişên Erdogan ên dagirkeriyê yên îro em dîsa dibin şahidê pêşdîtina wî.



# `Emê li pêşiya xeyalên Tirkiyê bisekinin`

Welatiyên bajarê Til Temir diyar kirin ku dewleta tirkî ya dagîrker bi êriş û kiryarên xwe yên hovane gelê herêmê dike amanca xwe û dixwaze cografya xwe fireh bike. Herwiha gotin, ji bo bêbandorkirina êrişan û pêşîgirtina li wan lihevkirin pêwîst e.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Dagîrkeriya tirkî êrîşên xwe yên hovane li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê didomîne û komkujiyên hovane li dijî sivîlan pêk tîne. Armanca van êrîşên dijmirovahî û tinekirina gelê Kurd, gelên resen yên li herêmê ne. Avakirina mîtêngeriyên nû û guhertina demografiyê ye. Dewleta Tirkan li ber çavê dinyayê û rêxistinên navneteweyî yên ku îdîaya parastina mafên mirovan dikin, sûcên li dijî mirovahiyê dike. Herwiha bêdengiya wan nîşana hevkariya wan ya bi sûcên dagîrkeriyê re diyar dike. Derbarê êrişên dagîrkeriya Tirkan yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, şêniyên bajarê Til Temir, nêrînên xwe ji me re anîn ziman.



### `Her ku bajarekî dagîr dike çavê wê li bajarekî din e`

Hevserokê Şaredariya Gel ya bajarê Til Temir Mihemed Baqî Kûtê da zanîn ku dewleta tirkî, dewleteke Osmanî ye û li ser zihniyeteke kevin ya osmaniyan, hem jî zihniyeta DAIŞê dimeşe û axaftina xwe wiha domand: "Tirkiyê bi hiceta ku Kurd xeterê li ser çêdike rewabûnê dide xwe ku êrişan ser Kurdan bike û roj bi roj van êrişên hovane zêde dike. Lê armanc ne Kurd tenê ne, çimkî gelek pêkhate li ser vê xakê bi Kurdan re dijîn. Tirkiye dixwaze Osmaniya kevin vegerîne û cografyaya xwe fereh bike. Bi vê yekê Tirkiyê parçeyêê herî pîroz û hêja li Sûriyê dagîr dike, da ku bi xaka xwe ve girê bide. Di xeyalên wê de heye ku ji Hesekê heta Mûsil, Kerkûk û Şingalê tevê bi ser xaka xwe ve bike. Çimkî daxwaziya wê ne 30 km tenê ye, her ku bajarekî dagîr dike çavê wê li bajarekî din e."

### `Tirkiyê şerê Ukrayna ji xwe re derfet dibîne`

Mihemed Baqî bal kişand ser şerê Rûsya û Ukrayna û got, Tirkiye vî şerî ji xwe re derfet dibîne ku êrişên xwe yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê zêde bike. Di demekê de ku cîhan tev bi şerê Rûsya û Ukrayna ve mijûl e, dewleta Tirkan ya faşîst jî êrîşên xwe yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê zêde kirine. Rojane êriş dike, li her deverê êriş dike û gel koçber dike.
Mihemed da xuyakirin ku çareseriya pêşîlêgirtina dagîrkeriya dewleta tirk, têkitiya gelên herêmê ye û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Pêwîst e danûstandin û nîqaş li ser vê yekê bên kirin. Yek rojê me fîşekek bernedaye hundirê Tirkiyê. Ti mafê Tirkiyê nîne ku van êrişên hovane li ser gelê me pêk bîne. Mixabin Tirkiye har bûye û çi tişta ku mafê mirovan binpê dike ew pêk tîne. Ji bo wê jî pêwîst e rûniştin û lihevkirinên li ser bingehê ku ti kes mafê ti kesî nexwe bên kirin."

### `Em berxwedan, destkeftî û xwîna şehîdan bernadin`

Mihemed Baqî got, Êrişên ku li ser bakur û rojhilatê Sûriyê tên kirin li ser xaka Sûriyê ne, tevî wê jî rejima Sûrî bêdeng e. Çimkî rejima Sûrî heta niha jî, ji destkeftiyên Kurdan ne razî ye. rejima Sûrî dixwaze Rêveberiya Xweser her tiştê xwe teslîmî wan bike û rewşa herêmê vegere wek berî ya 2011`an. Em jî dibêjin, em evqas berxwedan, destkeftî û xwîna şehîdên xwe bernadin. Me tiştek giran ji rejimê nexwestiye, em wekhevî û biratiya gelan dixwazin. Em ji bilî edalet û wekheviyê tiştek din naxwazin.
Mihemed Baqî Kûtê di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Bi saya fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan û projeya Neteweya Demokratîk, em gelê herêmê Kurd Ereb û Sûryan li hev civiyane û milbimil em berxwedan û berevaniyê li ber xaka xwe dikin. Hêza me îradeya me ye, wê serkeftin ya me be."



### `Tirkiye nikare xaka ku berxwedana gel lê heyî dagîr bike`

Rêveberê Saziya Malatên Şehîdan Mihemed Tahir Yûniş jî axivî û teqez kir ku armanca êrişan ew e ku hebûna Kurdan bi dawî bibe û wiha pê da çû: "Dewleta tirkî ya dagîrker ji ber ku li herêmên parastina rawa bi ser neket, êrişên xwe yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê zêde kirine. Tirkiyê her ku li herêmekê bin dikeve berê xwe dide herêmeke din. Niha jî êrişên xwe yên ser Til Temir, Til Tewîl, Girê Spî û gundewarên wê zêde kirine û dibêje ezê Til Rifat û Minbicê jî bixim destê xwe. Lê bi hevgirtina gelên me yên li herêmê û bidestekdayîna wan ji hev re, herwiha bi hêza parastina gel emê li hemberî êrişên Tirkiyê bisekinin, heta ku em civaka xwe azad bikin."

Mihemed di dawiya axaftina xwe de got, armanca dagîrkeriyê ew e ku bigihe xeta M4, ango 30 km ji herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û bi erdên xwe ve girê bide. Lê dagîrkeriya Tirkan nikare vê herêmê dagîr bike û girêdayî xwe bike. Lewra berxwedan heye û bi yekîtiya gelên herêmê ji ciwanan heta mezinan Kurd, Ereb, Suryan û Asûrî, wê li pêşberî êrîş, plan û xeyalên dewleta dagîrker bisekinin, heta herêm ji qirêjiya wan rizgar bibe.

## Ha li Rojava gotin na, ha li Başûr fermana êrişê dan!

**Idrîs Henan**



Van dawiyan, li Sûriyê, ji deng û qîreqîra gefûguran bilindtir nîne. Jixwe ne tenê li Sûriyê; him li herêmê û him jî li cîhanê ji bilî vê dengê giroc yê Erdogan nîne. Fena seyê har bûye belaya xwe di her kesî dide û çavên wî ji kiritandinê têr nabin. Berê çend rojan serokê Tirkiyê Erdogan, di rêzegefûgurên xwe de, xelekek nû ya kiritînê eşkere kir û got ku ew li ber qonaxek nû ya dagirkeriya axa Sûriyê ne. Di bin navê ewlekariyê de, ewlekariyê têk dibe. Li şûna aşîtî û aramiyê, şer û talanê belav dike.
Li gorî van daxuyaniyan, diyar e ku ti kesî piştgirî nedayê û ne jî kesekî jê re gotiye "Amîn" Lê tê fêmkirin ku li hemberî helwestên nerazîbûnê gav paş de avêtiye û berê xwe daye hevpeymankerê xwe yê Astana û Sûçî, dewleta Rûsyayê. Lê Rûsya jî ku cara yekê ye helîkopterên xwe bi vî rengî di ser çeperên Şehba, Efrîn heya Babê re difirîne, jê re dibêje; ti nikarî derveyî lihevkirina bi min re ti operasyonan li van herêmên di bin serweriya hêza min de ne bikî. Her wiha dibêje; ez li Ukranyayê bi ser ketime, hêza min têrê dike li Sûriyê jî berjewendiyên xwe biparêzim. Dêmekî nameyên cengê, dîplomatîk yên salên 2016, 2018 û 2019an hatine ceribandin, dubare dikin. Hîcar dixwazin carek dib bi rêyeke nû lihevkirineke nû bidin avakirin. Lê diyare jî şertên zeman û mekan ên wan salan naşibin ên roja me ya îro. Him aliyê hêzê û him aliyê itîfaqên navneteweyî de. Stratejiya ku berê bi awayekî veşartî jê re dihat xebitandin, îroj eşkere bi rêkûpêk dibe. Ji lew re, îroj DYE û li pişta wê welatên rojavayî, bi hemû hêza xwe destwerdana kirîza Ukranyayê li hemberî Rûsya kirine. Amerîka wê rojê digot; em ê çekên pêşketî yên zîrek bidin artêşa Ukranya. Rûsya jî ji bo vê pozisyona nû ya Tirkiyê biçewsîne û li dijî bloka dijber a Amerîka û Ewrûpa bişixulîne, bersivên xwe li hemberî gefên Tirkiyê net nake. Bi rêbazên radîkal pragmatîk, gêzerê nêzî devê Erdogan dike, lê nahêle gez bike. Hewl dide li dijî NATO'yê bi kar bîne. Tevî ku baweriya xwe bi Erdogan û Tirkiyê nabe, lê dîsa jî li ser hesabê têkoşîna gelan hewl dide bajo lihevkirineke li dijî bloka dijber. Ango hemû alî jî dixwazin di oxira berjewendiyên xwe de, têkoşîna azadiyê bi gelemperî ji nav bibin.
Ha li Rojava gotine em bi we re ne û em rê li ber êrişên Tirkiyê digirin, ha jî li Başûrê Kurdistanê fermana êrişên li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê dane. Sîstemek wisa durûyî ye ku siyasetek piralî a li ser bingeha qezencê dide meşandin. Ji lew re, hêza têkoşîna li hemberî hişmendiya desthilatdar a baviksalarî, ku bi piştgiriya gelan mezin bûye, çawa ku 50 sal in zêdetir pişta xwe daye Toros-Zagrosan, Hawar û Amanosan, wê hîcar li ser qabana xwe were pîvan û xwedî giraniya bandorwar be.
Ji xwe di cewherê herdu aliyan de, tunekirina enerjiya gelan a bi Tevgera Azadiyê re teşe girtiye re heye. Ji ber vê jî, ne dûr e û gelek gengaz e di şerê li hemberî hişmediya azadiyê de ku veguheriye awantajekî gelan, li hev bikin. Ramanên Tevgera Azadiyê, piştî hilweşîna sosyalîzma real û bi berxwedana li hemberî sermayedariyê mezin û bi hêz bûye re, çendîn rûbirûyî êrişên hovane kiribin, tekane bijarde û senteza gelan a azadî, edalet û demokrasiyê ye. Ji bona vê jî, her çendî daxuyaniyên cuda cuda derbarê van gefên Erdogan derketibin, gelek hêsan e ku sibê jî li ser me li hev bikin. Helwestên Siwêd û Fînlandayê ji bo tevlîbûna nava NATO'yê û civînên nepenî bi rejîma Tirkiyê re, vê rastiya me hewl daye rave bikin, baş vedibêje.